Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 164
06'ê Tebaxa 2011
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

Peyama sersaxiyê ya Mistefa Hicrî ji Mesûd Barizanî re

Birayê rêzdar, kekê Mesûd Barizanî
Serokê herêma Kurdistanê
tevî rêz û silavan

Em bi xem û daxbariyekê zaf ve seba koça dawiyê ya dayîka hêja ya we Hemayil xan sersaxiyê dibêjne we û malbata serbiline we û di xem û kovana we de xwe hevbeş dizanin. PDKÎ

Sekreterê Giştî/ Mistefa Hicrî
28.07.2011

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi

## Bi milyardan pereyê Îranê li Koreya Başûr de hat ragirtin

R: 2

## NY: Îran û Hizbulahê di kuştina leşkerên nerazî ên Sûriyê de dest hene

R: 2

## Çapemeniya Ewropa: Erdogan li dijî Kurdan arteşê ava dike

R: 7

# Beşar bi komkujiyê pêşwaziya Remezanê kir




Şoreş û serhildana xelkê Sûriyê jib o azadiyê her berdewam e û rejîma Beşar Esed jî bo temirandina vê serhildanê dest bo tepeseriyên herî tund û hovane dibe da ku bikare bi vî awayî deshilata xwe ya lerzok biparêze. Di dirêjiya wan cînayetan de rejîma Sûriyê bi tank û top û komkujiyê ve pêşwaziya meha Remezanê kir û gola xwînê birê xist.

Ew pêla nû ya tepeseriyan bû sedema hejandina wijdana mirovahiyê û li vê derheqê de mehkûmiyetên navnetewî bi dû re hatin Konseya Ewlekar ya NY serbarê vê ku heyamek bû li ser şermezarkirina rejîma Sûriyê li hev nedikirin û nakokî hebûn, lê di roja çarşemî 3'ê Tebaxê li ser şermezarkirina rejîma Sûriyê gihîştine encamê û daxwaz ji Sûriyî kirin ku desta ji tepeserî û kuştara xelkê nerazî bikşîne û rêz û hurmetê ji yasayên navnetewî re bigre.

## Raportvanê taybetî ê mafê mirovan daxwaza alîkariya tewaw ya Îranê kir

**Ehmed Şehîd raportvanê taybetî yê NY ku niha wek çavdêrê parastina mafê mirovan di Îranê de hatiye hilbijartin, ji berpirsyarên rejîma Îranê daxwaza alîkariyê kir.**



Ehmed Şehîd ragehand ku tewaya hewla xwe wê bikar bîne bona vê ku berpirsyarên rejîma Îranê mafê mirovan û yasayên navnetewî berçav bigrin. Wî herweha got ku emê li ser şahidîdana wan kesan kar bikin ku ji aliyê rejîma Îranê ve mafê wan hatiye binpêkirin.

Ehmed Şehîd pêştir wezîrê kar û barê derve yê Maldîvê bûye. Hilbijartina navbirî di demekê de bû ku ji sala 2002'an pêve rejîma Îranê îzin nedaye dawî raportvanê NY da ku erkên xwe yên yasayî di Îranê de birêve bibe. Herweha ji sala 2005'an pêde rejîma Îranê îzin nedaye tu raportvanekê ku bêne nav xaka Îranê de.



## Êrîşên berdewam û pîlanên bi tehlûke û qirêj!

Rûken

Sala 1991'an piştî bi salan xebat û tekoşîna Kurdên Kurdistana başûr bi dijî... R: 4



## Metirsiya rastên tundajo li Ewropayê

Rêbwar Fanî

Nûçeya kuştina 7 kesan li Oslo û 84 kesên din ji ciwanên Partiya Kedkar a Norwêjê di dema... R: 5



## Kilîla demokrasiya Îranê li hevxebtî û ...

Ebdulla Ebdî

Komara Îslamî a Îranê yek ji van sîstemên siyasî ye ku ji hemû aliyekê ve wekî rêjîmek... R: 7



## Zengilek li biniya çiyayê Mîrbihal

Mecîd Cinîkanlo

Hunermend hewl dide ku pêtir bizane û kûrtir bifikire û aliyên veşartî... R: 10

# Du heyetên PDK Îranê bi cuda beşdarî li merasima koça dawiyê ya Hemayîl xanê kirin

Roja Pêncşemî, 28'ê Tîrmeha 2011'an, heyetek payebilin a partiyê, bi serperestiya Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê beşdarî di pirse û sersaxiya Hemayîlê, hevjiya nemir Mela Mistefa Barzanî û dayîka Mesûd Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê kir û sersaxî û hevxemiya PDK Îranê bi birêz Mesûd Barzanî ragihand.

Hemayîl xan yek ji wan jinên xebatkar û nîştimanperwer ên Kurdistanê bû ku tevî kişandina êş û dijwariyên bi salan di jiyana şoreşê de, tevî Barzaniyan di Komara Kurdistanê de jî beşdar bûye û piştre jî weke jinek xebatkar rolek diyar û berbiçav hebûye.





Her di vî warî de, roja Şemî 30'ê Tîrmehê jî, heyetk din a PDK Îranê bi serperestiya Hesen Şerefî, Cihgirê Sekreter û hejamrek ji Endamên Deftera Siyasî û Komîteya Navendî ên PDK Îranê di sêyemîn roja pirseya Hemayîl xanê di mizgevta Sewafî li bajarê Hewlêrê de beşdarî kirin.

Heyeta PDK Îranê ji aliyê birêz Nêçîrvan Barzanî, Cihgirê Serok û hejmarek berbiçav ji Endamên Mekteba Siyasî ên PDK ve hat pêşwazîkirin û car din sersaxiya PDK Îranê bi wan ragihand.

## Sergotar

### Serdestiya Sipahê fermî bû

Selîm Zencîrî

**Pasdarê talançî ku di lîsteya tehrîmbûyên navnetewî de ye, bûye wezîrê Neft a Îranê**

Piştî midehek zaf bi ser kêşe û nakokiyên li dor diyarîkirina wezîrê neft a rejîmê, aqibet sê rojan berî niha ew posta vala û sê wezaretxaneyên din li ser pêşniyaza Ehmedînijad, dengê erê ji meclîsa rejîmê wergirtin. Bi vê çendê jî sipahiyek din bi dewleta leşkirî - emniyetî a Ehmedînijad zêdebû.

Korsiya Wezareta Neftê, yek ji girîngtirîn wezaretxane û postên dewleta Îranê ye ku heya niha li ser bidestgirtina wê, kêşe û pirsgirêkên zaf hebûne. Her alî û bandek rejîmê hewla qorixkirina wê daye, lê li vê navberê de hêzek diyarîkirî û metirsîdar heye ku şiyana rikeberî pêre nemumkin e. Ew jî hêza terorîstî- mafyayî a Sipaha Pasdaran e ku bi hebûna sermiyanek xeyalî û talankirî ji samana giştî a xelkê Îranê, li hemû biyavên leşkirî, ewlehî, aborî û siyasî a Îranê de rola xwe dilîze û serdestiya xwe bi tewahî sepandiye.

Bidestgirtina wezareta neftê ji aliyê Sipahê bi birêveberiya pasdar Rostem Qasimî, fermanderê qerargeha Xatemul Enbiya nîşana nehadîne û organîzebûna sipahê li siyaset û aboriya Îranê de ye û şeklek fermîtir dide vê hêza metirsîdar ku wekî sîvanekê siya xwe bi ser hemû organên hikûmetî û dewletî de sepandiye.

Diyarîkirina wî wezîrî bo wezareta neftê ji çend aliyan ve cihê baldanê û dê kêşexulqên û bi zirar be.

-Paşekişiya Ehmedînijad li hember Spah û Xamineyî de ye.

-Yasayî bûna desthilata xwe bi ser aboriya Îranê, bi taybet neft û samana giştî de nîşan dide û dê li berjewendiya xwe bo piştewanîkirina zêdetir ji teror û wehşetê bikar bîne.

- Sipahî bûna dewleta Ehmedînijad diselimîne.

-Wezîrê neftê li nav lîsteya tehrîmbûyên navnetewî de ye û ew karê hikûmeta Îranê zimanxwar kirine ji rojava, girîngînedan û pêpeskirina biryarnameyên navnetewî ye li dor tehrîman. Tehrîmên ku li encama wê de gelek ji sermiyandarên biyanî, kompaniya û şirketên mezin ên cîhanê neçar man Ji pirojeyên neft û gaza Îranê derkewin û cihê xwe dan sipahê. Encama wê jî em dibînin, talan û dizîna zêdetir û li hember de jidestdana pêgeha duyem berhemhênerê nefta OPEK.

Girîngiya vê mijarê li wê de ye ku piştî 35 salan çavnihêriyê, qirare Îran li çend mehên pêş de serokatiya rêxistina welatên hinardeyên neftê (Opek)'ê bike ku awahiya wê li Utrîş, yek li welatên YE' de ye. Ew tehrîma wî jî dikare kirîzafir be bo rejîma Îranê, ji ber ku him Şêwra Ewlekar, him YE û him jî DYE'ê, Rostem Qasimî li nav tehrîmên xwe de cih dane û îzna sefer û bidest xistina vîzayê tune. Niha ya girîng, peyam û derencamên wê diyarîkirinê bo rojava ne û dê çi karîgerî li ser seneta neft û gaza Îranê hebe. Yan ew zimanxwar kirin ji civaka cîhanî û guhnedan û pêpeskirina biryarnameyên navnetewî dê çi reaksiyon û derencamek cîhanî li pey re bîne.

# Seredana heyetek PDK Îranê bo Mekteba Siyasî a Yekgirtûya Îslamî a Kurdistanê

Roja Yekşemî, 31'ê Tîrmeha 2011'an, heyetek PDK Îranê bi serperestiya birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî û hejmarek ji Endamên Deftera Siyasî û Komîteya Navendî ên PDK Îranê seredana Mekteba Siyasî a Yekgirtûya Îslamî a Kurdistanê kir û ji aliyê wê pariyê ve bi germî hat pêşwazîkirin.





Di destpêk de, Mistefa Hicrî, keyfxweşiya xwe ji hevdîtina bi mamosta Selahedîn nîşan da û basek siyasî li ser rewşa Kurdistana Îranê û siyaset û bernameyên partiyê û sefera îsal a xwe bo dervey welat û guherînên ku di deverê de çêdibin xistin ber bas. Piştre mamosta Selahedîn tevî nîşandana keyfxweşiya xwe ji seredana heyeta partiyê, basek li ser rewşa Kurdistana Îraqê û deverê pêşkêş kir û rolê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bilind nirxand.

Her du alî di rûniştinek dostane de ra û boçûnên xwe derheq rewşa deverê û rewşa Kurd li her du beşên Kurdistana Îran û Îraqê de xistin ber bas û çendîn pirsên girîng ên pêwendîdar bi pirsa Kurd û pêşveçûna ku gelê Kurd di vî heyamî de bi xwe ve dîtiye, niqaşkirin û hewildan bo nehiştina arîşe û giriftên ser riya xebat û tekoşînê û penabirin bo diyalog û pêşveçûna demokrasuyê di deverê de, bi zaminê serkevtinê dan zanîn. Hêjayî gotinê ye ku piştî 2 demjimêran heyeta partiyê bi rêz û hurmet ve hat birêkirin.

# Bi milyardan pereyê Îranê li Koreya Başûr de hat ragirtin

**Li gor nûçeya R. Ferda, nêzîkî 4 milyard Dolar, berhema firotina nefta Îranê ku seba tehrîmên abûrî li dijî Komara Îslamî, di Koreya Başûr de hatyine ragirtin, aliyê kêm dê heya dawiya îsal a Zayînî her wa bimîne.**

Çavkaniyek Koreya Başûr daye zanîn ku ew qas pere heya dawiya îsal dê bigîje 5 milyard Dolaran.

Koreya Başûr yek ji eslîtirîn kirryarên nefta Îranê ye ku rojane bi awayek normal 230 hezar bermîlên nefta xaw ji Îranê dikre.

# NY: Îranê û Hizbulahê di kuştina leşkerên nerazî ên Sûriyê de dest hene



Li gor rapora komîsaryaya bilind a penaberan a ser bi NY, hêzên nîzamî ên Komara Îslamî û Hizbulaha Lubnanê li îdam û kuştina leşkerên nerazî ên Sûriyê ku xwe ji gulebaran kirina xwenîşanderan diparêzin, dest hene.

Ew rapore xwe li 20 rûpelan de dibîne û herweha cara yekemîn e ku nawendek fermî a ser bi NY bi eşkereyî navê her du hevalbendên rejîma Sûriyê(Komara Îslamî û Hizbula) tometbar bi dest hebûna li serkut kirina neraziyan de bike. Rejîma Îranê serhildana xelkê Sûriyê mehkûm dike û wê bi pîlan û kumpiloya derkî dizane.

www.arsivakurd.org

# Teror li kolanên Oslo û girava Utoeya



Ebdulla Hicab

Welatê aram û bê arîşeye Norwêj roja 22.07.2011 bû gola xwînê. Di encama êrîşek terorîstî de bo ser bînayên hukûmetê li navenda Oslo ya paytextê welat 8 kes û li girava Utoeya 69 kes bûne qurbanî. Piraniya 77 kesên ku di wê terorê de hatin kuştin lawên çalake girêdayî bi Yêkitiya Lawên Partiya Karkerên Norwêj bûn ku di nava wan de 2 keçên çalake Kurd, Bano Ebûbekir Reşîd (18) ji Başûrê Kurdistanê û Gizem Dogan (17) ji Konya ya Turkiyê jî hebûn. Koma lawên ku kete ber hêrişa terorîstî, weke edetê salane ya rêkxistinê ji bo kampa havînê li girava Utoeya kom bibûn.

Biker, Anders Behring Breivik yê 32 salî ji koka xwe Norwêjî ye û îdia dike ku bi serê xwe û tenê ew cinayet kiriye. Lê polîsê Norwêj hê lêkolîna xwe li ser wê terorê bi dawî nekiriye û negehîştiye encamê ka ew cinayet bi tenê ji aliyê yek kesî an ji aliye çend kesan ve hatiye kirin.

Breivik xwediyê îdeolojiyek rastrew ya tundajo ye ku dibêje bi armanca siyasî ew êrîş pêk aniye û mebesta wî ew bû ku kultûra Ewrûpayî ji êrîşên ji hundir ve yên kultûra Marksîstî û Îslamî biparêze. Li gor wî Îslam metirsiyek mezine bo ser kultûra Rojava û pêwîste pêşiya wê were girtin. Li Norwêj, partiya xwedî bandor ku herî zêdetir alîgirî ji firerengiya kultûrî û tevlîbûna civaka Bisilman bo nava civaka Norwêj dike Partiya Karkerên Norwêje (Det norske arbeider party) ye.

Ew partiya Sosiyal Demokrat niha di deselatê de ye. Biker ragihandiye ku ew êrîş li ber hindê pêk aniye ku riya tevlîbûna lawan bo nav refên Partiya Karkerên Norwêj bigre.

Çend saetan beriya wê hêrişa terorîstî, biker manîfestoyek bi navê; "2083, Daxuyaniya Ewrûpayî ji bo Serxwebûnê" di 1518 rûpelan de li ser hêla internetê weşandibû. Cewherê manîfestoya Breivik ewe ku welatên Ewrûpayî di pêşerojê de bi hev re federasyonek xurt ava bikin heya serokatiya cîhanê bi dest xwe ve bigirn. Ji bo ku ew federasyona ku ew bas dike bi tewayî ji kesên xwediya baweriyek derveyî mesîhiyetê paqij bibe, ew pilan dike ku hemû Bisilmanan li seranserî Ewrûpa, welatên Balkan u Bosniya û Albanî jî di nav de, derxe û wan bişîne bo Iran, welatên Ereb û Kurdistanê. Ya balkêş ewe ku ew di xeyala xwe de ciyê Kurdistanê jî diguhere, li ciyê Kurdistana îro du welatên mesîhî yên nû ava dike. Li gor wê pilanê mercê ku Federasyona Ewrûpa bi welatên Bisilman re di nava aştiyê de bijî ewe ku 1) ew Bisilmanên ku ji Ewrûpa têne derxistin wergirin, 2) serwerî û serdestiya Federasyona Ewrûpa bipejirînin û bikevin bin sergêriya Ewrûpa.

Di gel ku kiryara Breivik ji aliyê tu hêz û grûpên Rastrewe tundajo ve nehat pejirandin û piraniya wan grûpan ew hêriş şermezar kirin, lê kes û grûpên ku zêhniyeta wî di derbarê pêşeroja Ewrûpa de par ve dikin li hemû welatên Ewrûpayî hene.

Bi giştî grûpên rastrew amade ne ku ji bo paqijkirina Ewrûpa ji kesên ji derve ra hatine her karî bikin. Di wan çend salên dawî de li gelek welatan hin hêriş li dij kes û navendên bîhaniyan pêk hatine, lê kesê bawer nedikir ku rojekê kes an grûpên rastrew ji bo pêşve birina pilanên xwe civaka xwe bikin armanc.

Ji ber wê yekê di saetên yekê yên piştî wê terorê de berê her kesî li grûpên tundrewe Bisilman bû. Ji bo gelek kesan berguman tenê dikarî tevgera El- Qayîde u komikên girêdayî wê bin, lê tu kesî fam nedikir ka ji ber çi êrîşek weha rast li dijî Norwêj tê pêkanîn. Hema çend rojan berî wê hêrişê, wezîrê derveye Norwêj Jonas Gahr Stoere (51) bi şandek Taliban re rûniştibû, pêştir heman wezîr bi tevgera Hemas re têkilî danîbûn.

Bi giştî deselata siyasiye Norwêj her demê bi dialog û danustana bi her alî re bûye û tu gav nexwestiye pirsgirêkên cîhanî bi riya tundutîjî û şer bêne çareser kirin.

Lê 5-6 saet piştî şoka wê hêrişê, di germiya bas û nîqaşên li ser diyardeya terorê de, ji nişka ve şoka mezintir ji aliyê medya welat ve hate ragehandin û eşkere bû ku biker ji Norwêj û xwediyê dîtina raste tundrew e. Bi wê şokê re berê bas û nîqaşan hate guherîn. Roja pişt re ne tenê Norwêj û civaka Norwêjî, lê hemû Rojava xwe li hember diyardeyek nû ya terorîstî dît.

Berê pirsyar û nîqaşan bi yekcarî hate guherîn, ew car mela û qeşeyan li mizgevt û dêran hevudin hembêz kirin û basa hevgirtinan dînan li hember xirabiyê kete rojevê. Li kolanên Oslo êdî kesê bi çavê gumanê temaşey mêrên xwedî rêdîna reş an jinên bi serpêç nedikir. Rojev bi yekcarê hate guherîn.

Terora ku li Oslo û girava Utoeya pêk hat, ne tenê Norwêj û partiya deselatdar, lê hemû Ewrûpa hejand. Ji xwe partiya deselatdar tu gav ew hêriş weke bûyerek li dij xwe neanî hisabê û di pêvajoya dijkiryarên li dij wê cinayetê tu gav mijara hizbayetiyê neanî rojeva medya û civakê. Dewlet, Parleman, partiyên siyasî, medya , rewşenbîr, pêşengên civakê û bi giştî her kesê xwedî bandor di civaka Norwêj de bi yekdeng li hember wê terorê rawestan û hevbendiyek bê mînak ya neteweyî ava kirin.

Dema şoka bi hest ya piştî terorê derbas bû, ew car guftugoyên di derbarê pilanên pêşerojê de ji bo pêşîgirtin ji bûyerên bi wî rengî kete rojevê. Pirs ewe ka gelo metirsiya Tevgera Rastrewe Tundajo û bi giştî pilanên terorîstî wê di pêşerojê de çawan bêne sekinandin. Terorîstê siberojê kî ne û bi çi awayî wê pêşiya wan bê girtin.

Bûyerê nîşan da ku terorîst ji nav, nasname, netewe, ol an kultûrek taybet re nayên. Ew xwedî kultûr, ol, an reng u rûyek taybet jî nînin. Çavkaniya terorîsmê di hemû civakan de, li hemû îdeolojiyên girtî, li hemû herêman heye. Lê her car bi rengekê, li ciyekê û bi navekê serî hildide. Lewma ji bo sekinandina terorîsmê, tenê yek emraz, tenê yek rê , tenê yek alî têrê nake. Pêşîgirtin ji terorîzmê pêwîstî bi hevbendiyek cîhanî heye ku di hemû waran de kar bike. Kes an tu aliyek li derveyî civakê nehêle û kultûra dialog, hurmeta dualî û tehemulê bi pêş bixe.

Siyasetvan û karbidestên Norwêj bi helwêsta xwe ya eqlanî ku ji kultûra demokrasî û ji hev famkirinê re tê, gelek baş li ser wê bûyera bi êş helwêst girtin. Dijkiryara yekê ya serokwezîr Jens Stoltenberg (52) ji hestên tolstandin, tawanbar kirin û demargirjiyê pir bi dûr bû.

Stoltenberg di yekem dijkiryara xwe de got: "Ew teror wê nekare me ji armanc û hêviyên me yên pêşerojê paşve bizivirîne. Emê di bersiva wê hêrişa terorîstî de demokrasiya xwe xurttir bikin, civaka xwe zêdetir vekin, hewildanên xwe yên navneteweyî ji bo cîhanek pir ji aştî hê zêdetir bikin û rê nedin ku teror me û civaka me bitirsîne".

Piştî serokwezîr, şaredarê Oslo Fabian Stang jî heman gotin bi awayek din anî ziman: "Emê tole ya wê cinayetê vekin. Tolstandnina me wê bibe vebûna pitir, demokrasiya pitir û tehemula pitir". Roja piştî bûyerê, bi sedan hezar kes ji xelkê welat li hemû bajaran daketin kolanan û hevderdiya xwe ji bo qurbaniyan û îradeya xwe ji bo "vebûna zêdetir, demokrasiya zêdetir û alîkariya pitir ji bo pêşvebirina aştiyê di cîhanê de" nîşan dan.

Di xwepêşandanên Norwêj de, li ciyê duruşmên tund û tîj, aramî û bêdengî hebû, li ciyê emrazên tolstandinê, gulên sor û zer hebûn. Lewma navê xwepêşandanan danîn xwepêşandanên sorgulan.

Renge pêşiya teror û tund û tîjiyê bi sorgulan neyê girtin, lê mesaja dûrketin ji tolstandinê, zêde kirina demokrasî û derfetên beşdariyê, kultûra diyalog û aramiyê, hevbendî li dij tund û tîjî û bêtehemuliyê û vekirina deriyan wê meşrûiyetê ji tund û tîjiyê re nehêle.





www.arsivakurd.org

# Êrîşên berdewam û pîlanên bi tehlûke û qirêj!

**Rûken**

Sala 1991'an piştî bi salan xebat û tekoşîna Kurdên Kurdistana başûr bi dijî deshelatdarên dagîrker ên Îraqê û dana nirxek giran di vê riyê de, şiyan ji lawaziya deshilata wî çaxî ya Seddam Husên ku êrîşî ser Kuweytê kiribû, mifahê wergirin û dawiyê bi wê deshilata dagîrkar li Kurdistanê de bînin.

Di vê navberê de deshilatdarên dijî Kurd ên zal bi ser beşên din ên Kurdistanê de avakirina deshilatek Kurdî li herêma başûr de wek gef û tehlûkeyek bo ser xwe dihesibandin, lewra bi awayên cur bi cur ketin nava hewildanan de da ku vê ezmûnê têk bişkênin û nehêlin ku Kurd bibin xwediyê hikûmeta xwe.

Piştî wê ku karîn îdareya siyasî a xwe bikin, dujminên Kurdan bi taybetî deshitdarên rejîma Îranê ji bo lawazkirin û têkbirina deshilata sava ya herêma Kurdistanê pîlanên reng bi reng darêtin û heya qasekê jî têde bi serketin.

Rejîma Îranê mixabin şiya ku gellek ji pîlanên xwe bi taybetî terora neyarên xwe ên siyasî û akincî li herêma başûr ya Kurdistanê de cîbicî bike, lê xewna têkçûna vê deshilata sava jêre ser negirt.

Lê rejîmên dijî Kurd ên herêmê bi taybetî rejîma Îranê dest ji pîlanan nekişand û her carê bi awayekê û bi pîlanekê ketiye nav hewildanan bona derbe xistina li vê ezmûnê, ku li wan salên dawiyê de ew pîlan ji riya topbarana sînorên başûrê Kurdistanê birêve biriye da ku bi vî awayî hêza xwe nîşan bide û neêminiyê li Kurdistanê de pêk bîne.

Lê topbaran li wan çend rojên dawiyê de ku bi hêceta hebûna hêzên PKK tê encam dan, li rewş û kawdanek cuda de ye ku gellek armancên qirêj li pişt vê êrîşê hene ku em dikarin bi vî awayî wan polênbendî û parve bikin:

* Rejîma Îranê niha tevî kirîza abûrî û siyasî çi di asta navxweyî yan jî derekî de berbirû ye, û ji xebata medenî û gihîştina pêlên bayê Buhara Erebî bo Îranê pirr ditirse û dixwaze bi vekirina eniyeke şer li derwayî sînorên xwe ji aliyekê ve hêza xwe nîşan bide û ji aliyê din ve jî rê ji bo tepeserkirina xebata medenî xweş bike û şer veguhêze bo dervayî sînorên xwe.

* Rejîma Îranê ku bona zextxistina li ser îsraîl û Amerîkayê berdewam Hemas bo kar û kiryarên terorîstî, bikar danîne lê em dibînin ku Hemas û Feth hêdî - hêdî dev ji nakokiyan ber didin û dixwazin li ser bingeha qazane û berjewendiya gelê Felestînê li hev bikin, lewra rejîm bi vê yekê pirr aciz e û dixwaze bi derxistina PKK li çiyayên asê ên Qendîlê, hêzên tundrew ên terorîst li wir de akincî bike û berdewam ji wan terorîstan bi armanca şopandina pîlanên xwe ên qirêj û mirar mifahê bistîne.

*Rejîma Îranê seba vê ku di Sûriyê de gelên wî welatî daketine kolanan û bi armanca hiloşandina deshilata Beşar Esed, (wate hevalbendê herî giring ê Îranê) canê xwe gorî dikin, pirr nerehet e û dixwaze bala bîr û raya giştî li ser van cînayetên ku di Sûriyê de rû didin, bo aliyê şerekî din ku bixwe pêk aniye rakêşe.

*Rejîma Îranê bi pêşketinên li herêma Kurdistanê de aciz e, bi taybetî seba vekirina konsolgeriya DYA'ê li Hewlêrê de, lewra hewla neewle kirina Kurdistanê dide. Ji aliyekî din ve ji tirsê vê ku postên giring ên emnî û parastinê li encama kêmkirina wezaretxaneyan de bi Sunniyan bihên dan, dixwaze zextê bixe ser dehilatdarên herêma Kurdistanê da ku razî bi vê yekê nebin û dijî biryarekî weha derkevin.

*Rejîma îranê bi vê şertê şer bi dijî PKK'ê dike ku Turkiye jî desta ji piştewanîkirina ji dijberên Sûriyê bi taybetî Kurdên dijber hilgire, da ku pirsa Kurd di Sûriyê de bi tu awayî nehê çareserkirin, jiber ku çareseriya pirsa Kurd dibe sedema handana Kurdên beşên din ên Kurdistanê jî.

Bi vî awayî divêt ji her kesî re eşkere be ku armanca Îranê bi tu awayî tenê şerê li dijî PKK'ê nine, belkî ew şer gellek armancên qirêj dişopîne ku hewcehî bi hişyariyek zîrekane û siyasiyane ya Kurdan heye, da ku tewaya pîlanên rejîmê bibne bilqa ser avê..



# Konseya Ewlekariyê rejîma Sûriyê mehkûm kir



**Konseya Ewlekariyê a NY di daxuyaniyekê de ku roja Çarşemiyê 3'ê Tebaxê derkir, ragehand ku "Konseya Ewlekariyê nîgeranê rewşa hevwelatiyên Sûriyê û zaf nîgeranê kuştina xelkê ye".**

Lê piştî derikirina vê daxuyaniyê Dîmîtrî Mêdvêdov serkomarê Rûsiyê daxwaz ji Beşar Esed kir ku tevî opozisyona Sûriyê gotûbêjan bike û dest bi reformêm siyasî di welatê xwe bike. Navbirî herweha hişdarî da Beşar ku hekî reforman di welatê xwe de pêk neînê, wê bi qederek xembar re berbirû bibe.

Çalakvanên mafê mirovan bas ji kuştina pitir ji 2 hezar kesî heya niha di nearamiyên Sûriyê de dikin, û herweha rayedarek paye bilin yê saziya NY hejmara bê serûşûnbûyiyan di Sûriyê de, sê hezar kes ragehand û îşare bi destbiserkirina 12 hezar kesî jî kir.



**Hêzên rejîma Sûriyê girtiyan naîar dikin ku bêjin "La îlahe îlla Beşar"**

Hemwelatiyeke Sûriyê ku ji bajarê Dera'yê derketiye û xwe gehandiye welatê Mîsrê, eşkere kir ku hêzên ewlehiyê daxwazê ji girtiyan dikin ku bêjin " La êlahe îlla Beşar".

Ew şahid ku di rastî de karmendekî dewletî jî bûye, dibêje ku ez ji mirinê natirsim û di van meşên li Sûriuyê de gellek caran ji mirinê rizgar bûm, lê ez ji tirsê girtin û îşkenceyên fîzîkî û derûnî de reviyam. Kesên ku ji dervey Sûriyê dijîn nikarin êş û azara wan îşkenceyan wek girtiyan bixwe hîs bikin.



# Peymanek ji bo berjewendiya dagîrkeran!



Şehab Xalidî

Konferansa Lozanê di sala 1923'an de bona bidawî anîna şer li Rojhilata Nêzîk, li bajarê Lozanê ya Swîsrayê di navbera welatên berjewendîxwaz wate ji aliyekê ve Turkiye û ji aliyekî din ve welatên Yûnan, Feranse, Birîtanya, Îtalya, Japon, Romanî, û paşatiya Sêrb, Kirowat û Îslonî de, pêk hat. Wê peymanê çarenivîsa serkevtiyên di şerê yekemîn ê cîhanî û herweha Yûnan û Bolxaristanê di gel Turkiyê û rewşa sînorên wî welatî ku di ciyê dewleta Osmanî de rûniştibû, rohn û eşkere kir.

Peymana Lozan herweha dawiya şerê 1921 heya 1922'an ye di navbera Turk û Yûnaniyan de ragehand ku qazancên Turkiyê baştir ji peymana "Sêvr" dabîn kir, lê tu maf neda Kurdan û ji Kurdan re di cihê avakirina dewletek Kurdî, jêrdestî û dagîrkarî bi dîyarî anî.

Mixabin hebûna çavkaniyên pirr giring û dewlemend yên kanzayî weke asin, neft, mîs û korom, di Kurdistanê de, ne tenê nebû sedema geşekirina Kurdistanê di warê abûrî û siyasî û civakî de, belkî berevajî bû cih û qada şer û pevçûnan û rikeberiya li ser dagîrkirin û talana wan çavkaniyan, ku xwediyê wan tenê û tenê xelkê Kurdistanê ne.

Her ew çavkaniyên dewlemend yên xwezayî û kanzayî bûne sedema vê ku welatên derekî weke Birîtanya, Feranse û çend welatên din, di gel dewleta ji nû ve avabûyî ya Turkiyê li ser qazanc û berjewendiyên xwe li hev bikin, û di konferansa Lozanê de li ser parvekirina Kurdistanê û çareser nekirina pirsa Kurdan û dana %10 ji beşa nefta Kerkûkê bi Turkiyê li hev bikin.

Bi vî awayî ji aliyekê ve Ataturk bi birina nûnerên Kurdan bo Meclîsa wê demê ya Turkiyê û xapandina Kurdan di vî warî de ku di Turkiyê de Turk û Kurd xwediyê mafên wekhev û birayê hevin û tu kêşeyek di navbera wan de tune ye, û ji aliyekî din bêdengiya nûnerên Kurdan li hember biryara dawiyê ya konferansa Lozanê bû sedema vê ku ew peyman zirar û derbeke giran ya mirovî û siyasî li gelê Kurd bixe, û peymannameya Sêvr jî bête jibîr kirin, û ew derfeta dîrokî bibe goriyê ne siyasîbûn û sadeyiya Kurdan û qazanc û berjewendiyên dagîrkerên derekî û herêmî.

Li benda 62'an ya peymannameya Sêvr de hatibû: "Ew komîsyona ku di Qostenteniyê de, civînê dê pêk bîne, (Pêkhatî ji kesên diyarîkirî ji aliyê Birîtanya, Feranse û Îtalyayê) heya şeş mehan piştî cîbicîkirina vê peymanê, dê projeyekê ji bo otonomiya herêmên Kurdakincî li rojhilata Foratê, û başûra sînorê başûrî ê Ermenistanê, ku di rojên bê de, wê bê diyarîkirin û herweha herêmên li bakûra sînorê Turkiyê bi Sûriyê û Beynelnehrînê re, bi awayekî ku di bendên 2, 3, û 27'ê de hatiye, dê projeya xwe amade bike". (Dîroka hevçerx ya Kurd, R, 703 Dêyvîd Mekdawil ).

Bi vî awayî serbarê vê ku şoreşgerên wek Simkoyê Şikak, Şêx Seîdê Pîran, û Şêx Mehmûd bona azadî û rizgariya ji bindestî û bêmafiyê xebat kiribûn, lê gelê Kurd bû goriyê qazanc û berjewendiyên dagîrkeran û rewşa siyasî, civakî, abûrî û çandî ya Kurdan ne tenê baştir nebû, belkî roj bi rojê xiraptir bû.

Her çend heya niha jî tewaya hewlên dagîrkerên herêmî û derekî bêdengkirina Kurdan bûye, û serbarê kêşeyên ku bi hevre hebûne, lê hertim li ser pirsek hevbeş wate pirsa Kurd gellek bi hêsanî li hev kirine, lê dîsan jî Kurdistan hertim çepera azadîxwaziyê bûye û xebatek bi xwîn li her dereke Kurdistanê berdewam kiriye, û encama vê xebatê jî misogerbûna desthilatek Kurdî ji bo Kurdistana başûr bûye, û ew xebat bê şik û guman heya azadiya tewaya beşên Kurdistanê, wê her dom bike û qet nasekine.





# Metirsiya rastên tundajo li Ewropayê



Rêbwar Fanî

Nûçeya kuştina 8 kesan li Oslo û 69 kesên din ji ciwanên Partiya Kedkar a Norwêjê di dema seyranekê di girava Utoya, raya giştî a cîhanê bo aliyê xwe rakişand. Behring Breivik, ciwanê 32 salî yê Norwêjê, ew kiryar encam dabû. Lê piştî bûyerê û berî eşkerebûna tawanbar, pirraniya ragihandinan bi helwestek bilez, Elqaîde û Misilmanên tundajo tometbar kirin. Ew helwesta bilez a mediyayên Norwêjê bû sedem ku gelek ji penaberên misilman li şeqam, utobûs û şemendefiran ji hêla xelkê ve bêhurmetî bi wan bê krin.

Polîsê Norwêjê dereng çû cihê bûyerê. Ew derengmayîna polîs bû sedema hatine kuştina hejmarek zêdetir ji ciwanên Partiya Kedkar. Polîs sedema wê jî bo kêmbûna hêzê û nebûna îmkanatan ragihandiye. Breivik, rastekî tundajo bû ku bo midehê 10 salan heya sala 2007'an, endamê ektîv ê saziya Ciwanên partiya regezperest a "Pêşveçûn"ê bû. Partiyek ku pêka rapirsiyan %20 deng hene.

Berevajî gotinên parêzerê Biraywîk ku vê êrîşê bi dînatî yan nexweşiya derûnî a êrîşber dide zanîn (axavtinek ku gelek caran bi armanca veşartina rîşalên siyasî – civakî ên bûyerên hanekî tên kirin), lê hilbijartina cih û goriyan bi tu awayî nişkêveyî nebûye. Ew bi pilan, merem û armancên siyasî hatibûn hilbijartin. Pirraniya endamên ciwan yên partiya Karker, zarokên malbatên penaber û rewendên di wî welatî de ne. Li Norwejê jî herwekî gelek welatên din yên Ewropayî li 30 salên derbasbûyî de, penaberên zaf bo wî welatî hatine rêdan heya ku ji hêza kar a erzan ya wan mifahê werbigrin. Lê di salên dawiyê de bi destpêkirina kirîza aborî li cîhanê û xurtbûna wê li sala 2008'an de, êdî tu hewcehiyek bi wan karkerên penaber nebûye, lewma siyasetên dewletên Ewropayî, wernegirtin, gefxwarin û herweha dersînorkirina wan penaberan bo welatên xwe bûye. Lewre ye em dibin şahidê derketina raman û hizrên rastgera li Firansa, Danmark, Alman, Birîtanya ... û hwd. Norwej jî derveyî vê qaîdeyê nebûye.

Li gor rapora Asoşêtid pirês'ê, raya giştî û ragihandinên giştî ên Norwejê ji helwest, dijkiryar û sistiya Polîs di dema bûyera han de ne tenê razî ninin, belkî didin ber rexneyan. Lewma serokwezîr biryara pêkanîna komîteyek taybetî a lêkolînan da. Lê wezîrê dozgeriya Norwejê spasiya hewl û kiryarên polîs kir.

Gulebarana li wir nêzîk bi demjimêrek û nîvan berdewam kiriye û bûye sedema mirina 69 kesan. Andirês Birîng Biroykê bikuj, berê bûyera girava Utoya, bumbeyek li awahiya Serokwezîrî a Norwejê de danîbû ku bûye sedema can ji destdana 7 kesan. Parêzerê Breivik ji zarê wî ve dibêje ku armanc ji encamdana wê kiryarê, destpêkirina "şoreşekê di Rojava" de bûye. Herweha navhatî xwastiye bi vê kiryarê Ewropa û Norwejê ji musteimire kirina misilmanan rizgar bike.

Ew renge bi tawana cînayet dijî mirovahiyê bihê dadgehîkirin. Serdozgerê Norwejê jî daye zanîn ku polîs dixwaze dosyayek wiha li dijî Breivik amade bike. Ger tawana wî tenê terorîstî bûya, renge bo 21 salan zîndanê hatibe cezadan. Lê ger bi tawana cînayet dijî mirovahiyê bihê mehkûm kirin, dê bi 30 salan girtinê bihê mehkûmkirin. Wî ji zarê parêzerê xwe ve daye zanîn ku "xembare ji kuştina mirovan, lê neçar bûye wî karî encam bide heya ku bikare bi qewlê xwe şoreşekê li Rojava de pêk bîne.

Breivik di yekem civîna dadgeha xwe de gotiye ku "Bo rizgarkirina Norwej û Ewropayê ji destê Marksîst û Misilmanên ku bi girûpî koç dikin"dest daye wî karî. Wî xwe bi "Naziyê wehşî" û dujminê Îslam û Marksîstê bi nav kiriye. Li gor senedekî 1500 rûpelî, navhatî ji sala 2009'an ve mijûlî darêtina pilana êrîşek han bûye. Wî encama bûyera han bo hişyariya xelkê Ewropayê bi girîng bingehîn zaniye.

Serpolîsê Nourwejê di vî warî de dibêje: " Dewleta Norwejê li derbasbûyî de kêşe û pirsgirêkên mezin bi girûpên Nionazî re hebûye û li ser vê baweriyê bûn ku nifûza wan girûpan di nav civaka Norwejê de gellek lawaz bûye û wek gef nahên hesibandin.

Piştî bûyera han wezîrên welatên Yekîtiya Ewropayê li ber de ne ku di rûniştina xwe de mijarên tundajotiya îslamî, rastgerayên tundajo û dijatiya biyaniyan bixin ber bas. Wan herweha daye zanîn ku li ber de ne ku karbidestên Norwejê jî gazî bikin. Ji ber ku Norwej heya niha jî endamê YE'yê nine. Ji aliyek din ve jî Yoropol, Polîsa Ewropayê jî ragihandiye ku dixwaze bi awayekî micid li ser mijara bîr û hizrên tundajo ên rast lêkolînê bike û wêneyek rohn ji vê diyardeyê nîşan bide. Herweha Serokwezîrê Norwejê gotiye ku Norwej paşekişiyê nake, belkî ber bi demokrasiya geşekirîtir ve gavan bawêje.

www.arsivakurd.org

# Berdewamiya Wehşetê,
## îradeya berxwedanê bihêztir dike



Selîm Zencîrî

Piştî zulm û sitemkariyên bi salan ên dîktatoriya malbata Esed bi ser gelên Sûriyê de, êdî bêdengiya wan şikest, sebr û hêrsa pengurî a wan teqiya û dîwarê tirs û wehşeta wan jî hiloşiya. Wan di gavek çavnihêrînekirî de serhildan û xwenîşandanên aştîxwazane kirin metod, banga azadîxwaziyê kirin durûşm, guhertin û demokrasî jî kirin armanca xebatê.

Lewma qasê pênc mehan e ku pêlên demokrasîxwaziyê bi awayek herî xurt rû ji Sûriyê kirine. Lê deshilata şûm a Sûriyê hêj li xeyalan de dijî, liv, bizava û serhildana xelkî bi biyaniyan û pîlanên wan girê dide. Rejîm bo pasawdana kiryarên xwe, riya şidet û serkutê ku tu car serketî û rêçare nebûye, diceribîne. Encama vê çavsoriyê heya niha bi kuştina du hezar kesan, birîndariya bi hezaran kesan, bêser kirina bi hezaran kesan û bê mal û hal û derbider kirina bi hezaran kesên din jî bidawî bûye. Lê gelo ma karîne dawiyê bi nerazîbûnan bînin?

Ma bi xurtkirina pêlên serkutê îrade û cesûriya xelkê jî xurttir nebûye? Ma bi rijandina xwîna zêdetir, hesta berxwedanê bihêztir û agirê xebata li dijî desthilata xwe jî geştir nekirine? Ma bi wan cînayetan rûyê rastîn ê xwe dernexistin holê? Ma meşrûîyeta mayî a xwe jî nebirin bin pirsiyarê? Û ...

### Bêdengiya we me dikuje

Serê 2o heftiyan in ku serhildan û berxwedana gelên Sûriyê li dijî desthilta 48 salî a malbata Esed berdewam e. Her în û hefte bi navekê hatiye binav kirin. Êdî medya û ragihandinên biyanî li boseyê de dibin ka gelo îna tê dê bi çi nav û nîşanekê û çiqas karîger û bigivaş be li ser rejîmê. Îna derbasbûyî cuda ji her înek din bû, ji ber ku peyam û mesajek girîng li wê înê de hebû. Ew jî banga xwepêşanderan ji bêdeng û dudilên Sûriyê, ji serokên kerr û kor ên cîhana erebî û ji lawaziya helwestên rojava û hemû mirovdost û azadîxwazan bû.

Her çend ku rojava helwestên hêja hebûne û serbarê mehkûmkirinê, gelek karbidestên Sûriyê û ji wan şexsê Serokkomar jî tehrîm kirine, lê bi qasê hewce û têra pêşî girtina ji encamdana cinayetên rejîmê nekiriye û nake jî. Lewma bi binavkirina wî înê, xwastin bala raya giştî û hevdengiya wan bo aliyê xwe rabikêşin daku rê û cihên hewce û givaşên rijdtir bo ser rejîma Esed bigrin ber xwe.

### Komkujiya Hema'yê dubare bû

Piştî wê peyam û daxwaza alîkariyê, hêrsa desthilatê zêde û hovêtiya wê jî çend qat bû û bi top û tankan çend bajarên weke Hema'yê dorpêç kirin û bi tundtirîn şêwe bersiva daxwaziyên xwenîşanderan da. Bi wateyek din Hema kire gola xwînê û zêdeyî 140 kuştî û sedan birîndar di nava xwînê de da gewizandin.

Esed bi komkujiya li Hemayê nîşan da ku tu ferqek bi bavê xwe re nine û her li ser şopa wî diherike. Ji ber ku ew bajar nîşan û sembola xebat û berxwedana li hemberî desthilata Esed e û di sala 1982'an de ji aliyê Hafiz Esed ve hat komkujî kirin û canê zêdeyî bîst hezar kesan jê standin. Rejîmê xwast carek din birîna kewn a wan vekole û bibêje ku çi bixwaze dikare bike û ew bê piştewan û alîkar in; lê piştî komkujî û cinayeta rejîma Esed li Hemayê, pêlek din ya nerazîbûn û mehkûmiyetên navnetewî li dijî desthilata Sûriyê dûre hat û gelek ji welatan gotinên tûj û hişdariyên tund dan û ger wiha jî berdewam bike, renge nîşaneyên din derdikevin holê.

Bankîmon: Esed ji mirovahiyê bêpar e. Sekreterê Giştî yê NY derheq komkujiya li Hemayê nerazîbûnek tund nîşan da û serbarê mehkûmkirina rejîma Esed, ragihand ku tu zereyek ji însaniyetê li Beşar Esed de nemaye.



### Rejîmê bi komkujiyê pêşwaziya Meha pîroz a remezanê kir

Ew komkujî û êrîşa hovane a rejîmê bo se xelkê sivîl li Hemayê û bajarên din ku heya niha jî berdewam e, hevdem bû li gel destpêka meha Remezanê ku bal bisilmanan pîrozî û girîngiyek taybet heye. Rejîma Sûriyê da selimandin ku xincî parastina desthilata nerewa û koşka zordariya xwe, girîngî û buhayê nade tu bawer û eqîdeyekê û amadeye dest bo her cinayetên din jî bibe.

### Remezan kabûsek ji bo rejîmê

Meha Remezanê ji gelek aliyan ve dibe alîkar bo pêşvebirina armancên xwenîşanderan. Ji ber ku hêcet û behaneyek başe ji bo kombûn û nerazîbûnan. Çûnku zorahiya xelkê Sûriyê bisilman in û li vê mehê de zêde rû ji mizgevtan bo biciânîna erkên mesebî ên xwe dikin, lewma mizgevt jî cihên hêja bo kombûn û hêcetek bo derketina ji malan û tevlî bûna bi xwenîşandanan e.

Her ew tirs û kabûse ye ku rejîm nîgeran kiriye û gelek mizgevt bi hêceta nûkirin û destkariyan daxistine. Jiber ew îmkan û derfetên ku meha remezanê dide xwenîşanderan, lidarxistina meşên nerazîbûnê ji wan re hêsantir dibe, lewre soz dane ku li vê mehê de dê dawiyê bi desthilata Esed bînin û her şev dê piştî fitarê derkevin qadan, lewma renge rojên dijwar li pêşiya rejîmê de bin.

### Dubendî li nav refên arteşê

Li çend rojên derbasbûyî de basa veqetîna gelek ji piledarên artêşa Sûriyê ji refên artêşê û vegeriyana wan bo hembêza gel tê kirin. Ji ber ku gelek ji wan li bin zext û givaşan de û berevajî xwast û îradeya xwe tên neçar kirin ku li hemberî bizavên gel û xwenîşanderan de rawestin û bibin şirîkê tawan û cinayetên wan. Lê hêdî hêdî nîşaneyên nerazîbûnê li nava wan de jî dixuye û her çend heta niha gelek ji wan bi vê sedemê ve hatine kuştin.

Çend rojan berî niha li Parêzgeha Dêrezorê şer li nava hêzên veqetiyayî û ewlehî de derketibû ku parêzgarê nû destnîşankirî ê wir jî li pevçûna navbera wan de hat kuştin û ger wiha bimeşe, renge gelek arteşiyên din jî tevlî wan bibin û hêzek nû ya gelî pêk bînin; ku eva jî destpêkek din e bo lawazbûna hêza tepeserkar a rejîmê.



### Kurd û beşdariya ektîv

Her çend ku heya niha kurd bi girseyî û ektîv dernetine qadan û xortên xwe ji kuştin û bêrehmiya rejîmê parastine. Eve renge siyasetek jîrane û taktîkek baş be, lê nabe xwe dûr rabigirin. Jiber ku derfetên wiha dîrokî ne û kêm caran tên pêş û bi her nirxekê be divê mifah jê bihê standin. Ji hêla din ve jî eva nayê vê wateyê ku xwe bispêrin destê qeza û qederan û balgê xatircemiyê danên bin serê xwe.

Heta niha çawan derbas bûye, eve tiştek e, lê dibe niha şûnde serbarê parastina yekêtiya xwe û rêxistina navmala kurd, bibin fakterek girîng, çarenivîssaz û rênîşander. Kurd divê bi hêza xwe a yekgirtî li hevkêşeyên siyasî ên Sûriyê de weke rastiyekê, xwedî rol û pêgeh bin. Dibe hemû derî û kanalên pêwendiyan bikar bînin daku mafên siyasî, netewî û çandî ên xwe bi opozîsyon û alternatîva piştî rejîma beis bidin qebûlkirin. Çunku pîlan û kumpiloyên mezin ji wan re di rê de ne. Civîn û kongireyên Antaliya, Stenbol û şamê nimûneyên zîndî û berçav ên wan dûrxistinan in ku çawa dixwazin kurdan li bazne û girovera siyasî a Sûriyê de bêpar bihêlin. Lewma dibe bo betalkirina van pîlanan ektîvtir bin.

### Encam

Piştî ewqas serkut û tepeseriyan, rejîm li siyaseta temirandin û kuntirolkirina xwenîşandanan de tûşî şikestê hatiye û nîşan da ku ne îradeya pêkanîna reforman heye û ne jî hizra qebûl kirina rastiyan. Êdî riya vegerê ne ji xwe re û ne ji xwenîşanderan re hiştiye û renge carê bi piştewanî û hevkariyên madî, menewî, locistîkî û leşkirî ên Îran û Hizbulahê dilgerm be, lê di encam de xebat û berxweda berdewama gelên Sûriyê dê rejîmê biçokde bîne û tawanbaran weke cînayetkarên şer bikişîne ber dadgehên navnetewî.

# Çapemeniya Ewropa:
## Erdogan li dijî Kurdan arteşê ava dike



Çapemeniyan dane diyarkirin ku Ozel zilamê herî xurt ê Erdogan e

Polîtîkazanên Ewropayî banga "Îstîfakirin ji bo demokratîkbûn û pêkanîna kirîterên Yekîtiya Ewropayê şansek e" li Erdogan kirin û çapemeniyê bal kişand ser Necdet Ozel ê ku bû serfermandarê giştî. Çapemeniyê da diyarkirin ku Ozel zilamê herî xurt ê Erdogan e, diyar kir ku dema Ozel Fermadarê Artêşê bû li hemberî PKK'ê şer dikir û got; "Daxwaza Erdogan ew e ku li dijî Kurdan artêş ava bike."

Pêvajoya piştî îstîfayan û awayê nû yê artêşê ji aliyê Ewrûpayê ve bi mereq tê şopandin. Dîplomatên li Ewropayê ji çapemeniyê re axivîn û bal kişandin ku îstîfa û darizandina generalan ji bo demokrasiyê firsendeke baş e. Polîtîkazanên Elman jî banga; "Dawî li desthilatiya leşkerî ya li ser siyasetê bîne kirin.

**Biryara wanTirkiye hejand**

Di dîroka hêzên çekdar yên Tirkan de ev cara yekê ye ku ev dibe.

li gora hinek agahdariyan berî civîna Şêvra Leşkerî ya bilind, hikûmet û leşkeran li hev nekirine û li encama nakokiyan de Koşaner û tîma wî îstifa kirin.

**Siyasetvanê kurd, Kemal Burkay piştî 31 salan vegeriya welat**

Siyasetmedarê kurd Kemal Burkay, piştî 31 salên xwe yên surguniyê vegeriya Stenbolêlê û li ber balafirgehê ji aliyê sedan kesî ve hat pêşwazî kirin. W î dabû zanîn ku ew dixwaze alîkariyê bide piroseya ''Vebûnê''.



**BDP: Burkay nikare bibe rîsipî**

Serokê grûpa BDP-ê û parlamenterê Şirnexê Hasip Kaplan mesajek ji Kemal Burkay re şand û ragihand ku di mesela beşdarbûna di heyeta rîsipiyan de gumana wî li ser rola Burkay heye.

Kaplan got: ''Em hemû bihevre dê riyekê bibînin, ya riyekê vekin, yan jî astengên ser riyê hilînin. Çareyeka din tune. Bi tena serê xwe xelasî nîne. Di rewşeka wiha de tu bixêr hatî welatê xwe Kemal Burkay.

**PKK: 'Nebe alavê polîtîkayên Erdoğan'**

Li ser axaftinên Burkay ên piştî vegerê, KCK daxuyaniyekê de ew hişyar kir

Di daxuyanîya KCK'ê de tê gotin ku, ew kesên piştî 31 salan ji Swêdê di demeke weha krîtîk de vedigerin Tirkiyê û dibêjin, çek ne çare ye, li ber çareserîyê asteng e û ji PKK'ê dixwazin ku bi awayeke yekalî dev ji çekan berde, divê bizanibin ku bi vê uslûba xwe xizmeta yekîtîya gelê Kurd nakin; berevajî xizmeta polîtîkayên tasfîye yê AKP'ê dikin.

Di berdewamîya daxuyanîya ku di rojnameya Tarafê de hatî weşandin de weha tê gotin:

"Heger meriv di bin navê rexnekirinê de, bi helwesteke li gel şerê piskolojîk yê li dij Tevgera Azadî tê meşandin tevbigere, ev yek nabe welatparêzî. Tu kes divê nebe figuranê polîtîkayên AKP'ê."

Rojev

# Kilîla demokrasiyê
## di hevxebatî û yekêtiya hêzên demokrat de ye



Ebdullah Ebdî

Komara Îslamî a Îranê yek ji van sîstemên siyasî ye ku ji hemû aliyekê ve wekî rêjîmek paremayî, serkutker, dijîmirovî, dijî azadî û bingehên mafên mirovan tê dîtin û tim bi çavê guman û wekî gef bo ser mirovahiyê tê zanîn. Eve jî di halekê de ye ku rêjîm ji ber karnameya xwe a reş û tarî him li asta navxwe û him jî di asta navnetewî de zêdetir ji hemû demekê ketiye bin givaşan û bi tenê maye. Ew ji bo parastina xwe û berfirehkirina hêza siyasiya xwe ji her mekanîzmeke dijî mirovî mifahê distîne û dijberiya hemû bîr û hizrên însandostane û azadîxwazane di îranê û cîhanê de bi mafê rewa û demokrasiyê jî wekî dujminê sereke yê xwe dihesibîne.

Eger heta niha vê rêjîmê karîbû ji rêya propagandayên ayînî û mesebî, yan hezîne û mezaxtina sermayeyên zore aborî, gelek kes û aliyan li dewra xwe bialîne, lê bi xweşî ve niha em dibînin ku rejîmê ne tenê nifûz, pêgeh û rewatiya xwe li nav gelên Îranê de bi tewahî ji dest daye, belkî li nav dem û dezgahên wê de jî, bi sedema nakokiyên zaf li navbera desthilatdaran de meşrûiyeta mayî jî ketiye bin pirsiyarê. Her yek ji wan bal û eniyan dixwaze desthilatek zêde û li beşek zêde ji dizî û talankirina mal û samana giştî a gelên Îranê ji xwe re misoger bike.

Ger ew şer û kêşeyan gav bi gav li gel temenê rejîmê re berdewam kiriye, lê niha bi hatine ser kar a Ehmedînejad, şerê wan şikl û metodek tazetir bi xwe ve girtiye û perr û baskên xwe kişandiye nav hemû biyav û nawendekê. Stroktora vî şerî gihîştiye astekê ku gelek kesên nenas û neşareza li siyaseta rejîmê û dîroka wê, dixwazin rolê alahilgirê demokrasiyê bidin Kerubî û Mûsewî li şerê han de. Lê ew bêhay ji cînayet û karnameya reş a her du binav reformxwazan in û nizanin ku armanca wan û hevbîrên wan ne demokratîze kirina Îranê ye, belkî tenê parastina rejîmê û vegerandina wê bo salên destpêka şoreşa gelên Îranê ye. Ku li vê derheqê de dîrok jî şahid e ku reştirîn serdemê Komara Îslamî bûye. Tenê armanca wan rizgar kirina rejîmê ji vê bahozê û qopiya ku tê çeqiye ye. Lewma komara Îslamî ne reform hilgire û ne jî bawer bi reform û guhertinên demokratîk heye.

Li dor van şer û nakokiyan de renge pirsiyarek bo hin kesan bihê pêş ku erê gelo ev encama wan nakokiyan, dikare vebûna dergehekê yan destpêka tîrojkekê be bo bicihbûna demokrasiyê di Îranê de? Lê xwendin, têgihîştin û nirxandinek baş ji dîroka rejîmê, sîstema birêveberî û siyasî a Îranê li sê dehsalên borî de dikare biselimîne ka encamên dilxwaze me hene yan na?

Gelek ji pispor û şarezayên siyasî li wê baweriyê de ne ku ger nakokî bikewe nav sîstemên dîktator de, ew yek dibe fakterek bo pêşveçûna demokrasiyê ji rêya reforman ve.

Eve jî nahê vê wateyê ku aliyên nakok di nav desthilatê de têkoşînê dikin ku desthilatê razî bikin daku reforman di sîstemê de pêk bîne, bona wê ku bikarin desthelata xwe garantî bikin. Lê ev metod tenê dikare li van sîsteman da birêve biçe ku girêdayî îdeolojîyek xasmanî nînin. Bo nimûne em dikarin îşare bi zor sîstemên seltenetî li Ewropa bikin ku li serdemê destpêka serhildana demokrasîxwaziyê de, neçar bûn gav bi gav ji rêya reforman ve, desthilatê bidin destê xelkê û parlemanê, bona wê ku bikarin li hember de nasnavê xwe wek şa li wan welatan da biparêzin. Îro em dibînin ku ew welatên ku berê ji aliyê sîstemek dîktatorî anku "Auktoritär" ve birêve diçûn, ji rêya riforman ve gehîştine asteke yekcar başe demokrasiyê. Lewma derfeta guhertinan li sîstemên auktoriter de zortir e.

Sîstema siyasî a Komara Îslamî berevajî rejîmên dîktator û auktoriter, li ser bingeha îdeolojiyek mesebî hatiye avakirin ku hemû derfetekê ji piloralîsma siyasî digre, û hemû kar û barên birêveberiya siyasî, aborî, civakî û perwerdeyî li çarçoveya wê îdeolojiyê de tê destnîşan kirin, û tu kesî jî (çi li nav desthilatê yan derveyî desthilatê) mafê rixne û gazindeyan nine. Eve jî tê wateya ku Komara Îslamî sîstemek totalîtarîstî ye û tu tiştî li derveyî çarçoveya siyasî a xwe qebûl nake. Her wusa bo parastina desthilata xwe jî, li her mekanîzmeke serkut û tepeseriyê weke mifahê werdigre.

Rejîmê bo vê mebestê jî dehan dem û dezgehên tepeserkar weke îtilaat, sipah, besîc û organên din ava kirine ku li serkut kirina xelkê mafxwaz de xwe ji tu riftar û kiryarên dijî mirovahî naparêzin. Vê derheqê de em dikain bêjin ku Komara Îslamî, birêveberê îdeolojiyeke faşîstî weke rêjîma ''Mussolini'' ye ku tu mecal û fersendekê bo reform û guhertinên siyasî yan demokratîk li sîstema siyasî a Îranê de bicî nahêle.

Li rastî de şerê rayedarên rêjîmê tenê dikare wê derfetê bo azadîxwazan pêk bîne ku dengê mafxwaziya xwe bilind bikin û bibine alîkar bo zext û givaş xistine ser rejîmê û perawêz xistina wê weke sîstemek hov û dijî mirovî. Lewre tenê yekêtî, hevkarî û xebata berdewam, bihêz û xurt li navbera gelên azadîxwaz ên îranê û opzîsiyona demokrat û mirovdost e ku dikare vê rejîma sitemkar biçokde bîne û bibe kilîlek bo vekirina deriyê demokrasiyê li Îranê da.

www.arsivakurd.org

# Di Îranê de pirtûk jî tawan e



Sadiq Vehdanî

Pirtûk alavek e bo parastin û veguhastina zaniyariyan û bi liberçavgirtina cur bi curbûna zanist û hizrînan, pirtûk jî ji mijarên cur bi cur pêk hatine. Ji pitrûkên felsefî heya pirtûkên ku bo derbaskirina demî tên xwendin.

Zanayan li despêka avabûna rênivîsê de, dest bi nivîsandina bîr û hizrên xwe kirin daku bikarin hizrên xwe bi vî awayî biparêzin û bo kesên din bidine nasandin.

Li naverasta sedsala 15'ê Zayînî de, Pêvajoya veguhastina zanistên ku bi awayê nivîskî bûn, tevî çêkirina dezgehê Çapê bi destê "Gûtenbêrg", hate guhertin. Anku pirtûkê wateyek nû bi xwe ve girt. Nivîsîn bi tîrajên pêtir ketin ber destê kesên zêdetir û pêvajoya veguhastina zaniyariyan bileztir bû.

Pirtûk jî bi avabûna dezgeha çapê, awa û wateyek nû bi xwe ve girt. Pirtûk bi mijarên cur bi cur û li gor hewcehî, hizrîn û selîqeyên xelkê ketin ber destê gelek ji xelkê cîhanê. Her bi vê sedemê nivîskarên pirtûkan jî bi nav û deng bûn û karîn bîr û rayên xwe bi xelkê bidin nasandin. Ji aliyek din ve ticaret û bazara pirtûkan, anku aliyê abûriya wan jî li ser mijarên pêwendîdar bi pirtûkan zêde bû. Lê pirtûk hertim weke alavek bi buha tê naskirin ku aliyên meinewî ên wê bihêztir in, heya aliyên abûrî.

Pêka berfirehbûna çanda pirtûk û pirtûkxwendinê bi awayê nû di cîhanê de, pêvajoya çanda han gihîşte Îranê jî û gelek ji pirtûkên ku di derveyî Îranê hatibûn çapkirin, pêtir bi mebesta bikaranîna wan pirtûkan di sîstema perwerdê li vî welatî hatin wergêrandin. Herweha gelek ji nivîskarên Îranî jî dest bi nivîsînê kirin û pirtûkên xwe dan çapkirin.

Her çend ku berê şoreşa 1979'an, nivîsîn û çapa pirtûkan li gel astengiyên cur bi cur ber bi rû bû, lê piştî sala 1979'an rewşa çanda pirtûk û pirtûkxweniyê ber bi xirabtirbûnê çû, sansor zêdetir bûn û hemû pirtûk diviya li jêr çavedêriya dezgehên dewletî, wate wezareta Îrşad de hatiba çapkirin.


Bi taybetî piştî avabûna Şêwra Şoreşa Çandî, pêvajoya çapa pirtûkan awayek nû bi xwe ve girt. Stiratejiya giştî ya şêwra han ji aliyê Xumênî ve hat diyarîkirin û bi tewawî siyasetek nerênî û dijî çandî di pirogiramên wê şêwrayê hatin diyarîkirin.

Şêwra han di hemû qonaxên pêvajoya çapa pirtûkan destêwerdan heye û li gor stiratêjiyên serekî ên xwe weke, dijberî li gel diyardeyên Rojavayî di nav berhemên çandî de û geşedana çanda Îslamî di hemû warên jiyana xelkê Îranê, rejîm hewl dide ku siyaseta han bi ser berhemên çandî weke pirtûkan de bisepîne û bi danîna yasayên Çapemeniyê, pêşî ji berhemên ku bi qazanca desthilatdariya îdeolojîk a wan nebe bigrin.

siyaseta han di hemû qonaxên desthilatdariya rejîmê hatiye birêvebirin û yasayên pesendkirî di Şêwraya Şoreşa Çandî a Îslamî, diviya ji aliyê dewletê ve bihên birêvebirin.

Çend heftiyan berî niha, Xamineyî di gotinek di warê rewşa pirtûkan de di Îranê de got ku nabe em îzn bidin ku her pirtûkek di civaka Îslamî a me de bihê çapkirin û renge mijarên hinek ji pirtûkan bi qazanca civaka Îslamî nebe. Wate dîsan sansor û qutkirina çandê.

Xaminêyî dibêje hinek ji pirtûkan bo xelkê xirab in û em diviya pêşî ji çapa wan pirtûkan bigrin. Lê ya ku li vir girîng e, ev e ku karbidestên rejîmê li ser çi bingehekê xirabbûn yan başbûna mijarên pirtûkan diyarî dikin?



# Di pêvejoya dijberî li gel mediyayan; şikesta pîlanên rejîmê

Siyaweş



Di van çend hefteyên derbasbûyî de nûçeyên komkirina dezgehên setelaytê li Îranê û cezadana xwediyên wan dezgehan pirr tên bihîstin. Her çend ku pêvajoya han di salên berê de jî hebû û her sale hêzên Komara Îslamî di demên taybetî ji sal de setelaytan kom dikirin, lê karê han di van çend hefteyên derbasbûyî de bi awayekî berfireh û bê mînak tê dîtin.

Li gor lêkolînên di vî warî de, pêvajoya mifahwergirtin ji setelaytan ne tenê di bajarên mezin ên Îranê geşe kiriye, belkî di bajarên biçûk de jî bi awayekî berfireh xûya ye û herweha bandora kanalên mahwareyî di hinek ji diyalog û riftarên xelkê de xûya ye. Eve bixwe nîşanderê kêmbûna asta bandora ragihandinên teblîxatî ên rejîmê ye.

Taybetmendiya riftara rejîmên dîktator li hember ragihandinên rikeber, serkut û sansor e. Bo rejîmên dîktator weke Îran, ragehandin rolek girîng di ragirtina desthilatê bi ser xelkê de dilîze.

Rejîm bi qutkirina ragihandin û mediyayên ser bi welatên biyanî û bidestvegirtina hemû ragihandinên hindurî di 32 salên derbasbûyî de, hevwelatiyên Îranî xistiye jêr topbaran teblîxatiyên xwe û bo gihîştin bi armancên xwe jî ji her riyek nemirovan e mifah werdigre.

Rejîmê bi sînordarkirina ragihandinê û bi bikaranîna pîlanên cur bi cur weke derew, pîlanên teblîxatî, kêşandina hizrên giştî bo aliyê mijarên ne sereke û ... tenê bo ragirtin û bihêzkirina desthilata xwe hewl dide. Eva di rewşekê de ye ku bi tunebûna mediyayên azad û nehikûmetî û qutkirin û sansora wan mediyayan, rejîm hewl dide ku tu derfetek bo helsengandina mediyayên nehikûmetî bo xelkê nemîne.

Di vê rewşê de avabûna kanalên mahwareyî ên nehikûmetî di rastî de metirsiyek girîng bo desthilatê çê kiriye û rejîm jî bo dijberî li gel wan kanalan hemû hewla xwe dide ku ji riyên cur bi cur weke danîna yasayan di vî warî de pêşî ji berfirehbûna mifahwergirtina ji wan kanalan bigre. Helbet pîlanên rejîm tenê li danîna yasayan de nayê sînordarkirin, belkû bi xistina parazîtê û herweha çêkirina kanalên hevterîb hewil dide ku ji balkêşiya kanalên nehikûmetî kêm bike. Lê pîlanên rejîmê li hember berxwedaniya xelkê kêmbandor e û her ku diçe asta balkêşiya wan mediyayan zêdetir dibe.

Helbet heya çend sal berî niha koalîte(kêyfiyet, çavanî) û hejmara kanalên derveyî di astekê jor de nebû û mifahwergirtin ji wan kanalan pêtir di çarçoveya civakên bajarî û tebeqeyek taybetî ji xelkê Îranê bû, lê bi geşekirina kanalên Farsî, Kurdî, Azerî û ... ên nehikûmetî di warê kêyfî û zêdebûna hejmara wan, herweha pisportirbûna wan kanalan di warên siyasî, çandî, civakî û ..., bû bi sedema pitirbûna temaşavan û guhdarên kanalên han.

Kanalên nehikûmetî bi hurmetdanîn bi selîqe û berçavgirtina seqaya rastîn a civaka Îranê, stratêjiyek zîrekane û berpirsiyarane di pirogiramên xwe de bikar anîn û berçavgirtina esla hurmetê bi têgihîştina xelkê, sedema bingehîn di serkuta wan de bû. Eslek ku mediyayên rejîm tu car li ber çav negirtin û tenê qazanca desthilatê bo rejîmê girîng bû.

Ji aliyek din ve piştî nerazîtî û meşên xelkê Îranê di çend salên derbasbûyî de û liberçavnegirtina daxwazên xelkê û serkûta wan ji aliyê rejîmê ve, mediyayên jêr deshilatên hikûmetê hewl didan ku tu nûçeyek rast ji wan meşan bilav nekin û hertim mijûlî veşartin û derewkirin li gel xelkê bûn. Xelkê jî ku baweriya xwe li hember mediyayên hikûmetî ji dest da bûn, bi mifahwergirtina zêdetir ji mediyayên derveyî û nehikûmetî li dîv rastiyên rewşa Îarnê bûn.

Rejîmê hest bi vê yekê kiriye ku êdî nikare bi şantajên nûçeyî û înhisara mediyayî a xwe baweriya xelkê bi dest bixe, jiber vê yekê weke hemû caran hewl dide ku bi awayê polîsî pêşî ji geşekirina mifahwergirtin ji mediyayên nehikûmetî bigre.

www.arsivakurd.org

# Pêwendiyek serkevtî, pêwîstî bi wateyên hevbeş li nav mirovan de heye



Hemîd Muxtarî

Di zimanê Kurdî de ji bo çemka Communication, peyv yan bêjeya gihandin, ragihandin û pêwendîkirin hatiye. Ev çemka di bingeh de peyvek Latînî ye ku dibe Communicactions. Yekemîn car ev çemka 2300 salan beriya niha ji aliyê feylesûfê naskirî yê Yûnanê anku Erestû hatiye bikaranîn. Erestû di pirtûka xwe ya bi navê "Lêkolînkirin li ser Watayên Derbirrînê" de dibêje: **"Pêwendîkirin bi wateya geriyan e bo bidestxistina gişt alav û amarzên heyî ji bo haydan û razîkirin û dilniyakirina xelkê."**

Li vir Erestû ragihandinê wek amrazek dibîne bo haydan û razîkirin û xatircemkirina xelkê.

Herwiha Çarliz Kulî di pirtûka xwe ya bi navê "Çemk û Wateya Gihandin di Saziyên Civakî de", bi vî awayî gihandinê pênase dike: **"Gihandin mekanîzmek e ku bi bikaranîna wê, pêwendiyên navbera mirovan dirust û berdewam dibin û hemû hêmayên hizrî û amrazên veguhastinê û parastina wan di cih û dem de li ser bingeha wê geşe dike. Ragihandin şêwazên sûmet, riftar, hereke, awaza deng, peyv, nivîsîn, weşan, rêyên hesin, telegraf, telefon û gişt ew tiştên ku ji amrazên herî nû ve pêk tên ji bo zalbûn bi ser cih û dem de, bi xwe ve digire."**

Li gor pênaseya han, Çarliz Kulî girîngiya gihandinê di zalbûn bi ser dem û cih de dibîne anku lezîtî (xêrayî).

Ji aliyek din ve Dinîz Langlî û Mîşil Şîn Gihandinê bi vî awayî pênase dikin:

**"Gihandin piroseyek e ji bo gihandina zaniyariyan ji rêya bikaranîna amrazên cur bi cur ên ragihandinê ji cihekê bo cihek din, ji kesekî bo kesek din, yan ji amrazekê bo amrazek din."** Di pênaseya han de jî her du zanayên warê gihandinê amaraza ragihandinê wek alavekê dibînin bo veguhstina zaniyariyan.

Herçend ku gellek zanayan wek Şiram, Stanlî Baran, Laswil, Mîlir, Murîs, Bêrlo û... pênaseyên cur bi cur li gor dîtinên xwe derbarê ragihandinê pêşkeş kirine, lê di vê mijara me de mixabin cih nabe em hemûyan bas bikin. Lê pênaseyek ku zêdetir ji hemû pênaseyên din bala min bo aliyê xwe ve rakişandiye û zêdetir ez razî kirime, navbirî ye ji pênaseya Mafiyus Ismît. Navhatî di pênaseya xwe ya derbarê Pêwendîkirin de dibêje: **"Her karek ku ji aliyê kesek bê encam dan ku ji rêya wê ve kesê beramaber bikare ji vê fehm bike, jêre dibêjin pêwendîkirin, înca karê han bi bikaranîna amrazek ve hatibe encamdan yan bê amraz be."**

Ger mirov bala xwe bide vê pênaseyê, digîje vê encamê ku merca pêwendiyek serkevtî bikaranîna hêma û îşareyên hevbeş in. hêmayên ku her du alî fehmek hevbeş jê hebin. Dema ku şandiyar (sender) peyamek encoding anku bi remz dike û ji bo wergir dişîne, demek ev pêwendiya dikre pêwendiyek kemilî û serkevtî be ku ev wateya ku wergir di dema vekirina kodê de anku "decode" kirina peyamê de bidest dixe, yeksan be ligel ev wateya ku nêrer di dema "encodingkirina" peyamê de şandiye.

ku wusan bû li vir em dikarin bibêjin ku wate ne di peyam yan peyvan de ye, belku wate di nava mirovan de ye û ji kesek bo kesek di cuda û bi ferq e. Bo zêdetir fehmkirinê emê li vir bi mînakan ji we re vê pirsê ron bikin.

Kurek di malbtekê de mezin dibe ku di nav ew malabatê de diya wî xwedî tu desthilatekê nebûye û tenê karê wê şiştin û temîzkirin û nan lênan û xizmetkarî bûye. Ev kure ligel keçekê nasiyar dibe û dizewice ku diya wê di nav malbata wê de xwedî desthilat û nêrîn bûye, xwedî rêz û hurmet û xwedî biryar bûye. Di encam de dîtina wan du kesan derbarê hevjînê bi tewahî cuda ye û her yek bi curek li ser jin difikire, her du peyva jin bikar tînin, anku yek nabêje jin û yê din nabêje women, lê kur bawermend e ku diviya jin di nav mal de be ku xizmeta malbatê bike, û keç jî berevajiyê kur bîr dike.

wata kesayetiya jin û şonasa jin bal wan cuda ye. Li vir de em digîjne vê encamê ku wate bal mirovan in nek di nava peyam yan peyvan de ne.

**Mînaka duhem:**

Zarokek di malbatek olî de mezin dibe, ew di nav bajar de jiyan dikin. zarok hêj ne temenek zêde heye û hêj biçûk e. Rojekê zarok û diya wî li nav şeqamekê re derbaz dibin, nişkîve zarok çavê wî dikeve kutikekê û diçe bal kutik, kutik xwe nêzîkê zarok dike û xwe kicên wî disû, diviya zarok bi dîtina dîmena han bilez kurê xwe ji kutikê dûr dixe û dibe bo mal û hemû kincên wî derdixe û dişot û paqij dike û jêre dibêje ku se, heyvanek ne paqij e û diviya em xwe jê dûr bixin. Ew zarok 12 salî bû ku dibîne seyek birê wî yê biçûk digire û digeze. Malbata wî bilez birê wî digîjînin nexweşxanê û derziya dijî harî lê dixin daku tûşî nexweşiya harî nebe.

Ji aliyek din ve keçek di malbatekê li nav gundekê de mezin dibe ku bavê wê şivan bûye û wan heywan xwedî dikirin. Vê malbatê çend se hebûn ji bo şiyarbûn ji heywanan û herwiha ji malbata wan. Endamên malbatê jî nan didan seyên xwe û lê şiyar dibûn û bi seyan re dilîstin.

Hinek caran ku bavê keçê ji mal derdiket û direng dihat, seyê emegdar li ber deriyê malê li benda xwediyê xwe disekinî û her eva ku dengê pêyên hesbê xwediyê xwe dibihîst bi denge deng endamên malbatê agehdar dikir. Rojekê keçik bi çavên xwe dibîne ku birê vê ketiye nava avgirê (batlaq) û nikare xwe rizgar bike û dike qêjîn û hewar, bi nişkîve seyê wan xwe digîjîne birê wî û xwe dixe nava agir û kurik rizgar dike.

piştî derbazbûna çend salan bi ser bûyerên han ev keç û kur bi hev re nasiyar dibin û bi hevre dibin evîndar û di dawiyê de jiyana hevpar pêk tînin. Piştî derbazbûna çend salan rojekê dizek tê mala wan û hinek tiştên wan didize. piştî dizînê keç û kur bi hevre dikevin niqaşê û hevxemiyê û bas ji rêçareyekê dikin daku di pêşerojê de ev kar ducar nebe.

Keç wek rê çare daxwaz ji kur dike ku seyekê bîne bo mal daku ji wan re nobedariyê bike û haydarê mala wan be. Lê kur vê yekê qebûl nake û dibêje ku se pîs e. Keç pêşniyar dike ku bo ewê ku se temîz be, ev dê se bişot, lê kur jê aciz dibe û dibêje "Heywan ma mirov seyan dişot?" niqaşa ji hevxemiyekê derbarê pirsekê ve dest pê kir û piştre bû sedema dilêşiyê navbera wan de. Ger em bal bikişînin ser vê niqaşa em dibînin ku her du kesan ji peyva se mifah standin yanî yek ji wan negot se û yê din negot dog. Ku wusan e wate ne di peyvan de ye ji ber ku herduyan yek peyv bikar anî, belku wate li nav hundurê mirovan de ye. Ji ber ku nêrîna wan du kesan derbarê se ji hevdu cuda bû, lewra nexweşî û dilêşî kete nava wan de.

**ku wusan e em li dawiyê de car din tekez dikin ku wate li nav hundurê mirovan de ye. ne li nav peyvan de û ji kesekî bo kesek din jî vê wateyê cudayî heye.**

**Jêder: Pirtûka Dr. Mêhdî Muhsiniyan Rad bi navê (ارتباط شناسی )**




www.arsivakurd.org

# Zengilek li biniya çiyayê Mîrbihal li gişt Kurdistanê deng veda




A: Mecîd Cinîkanlo

Hunermend hewl dide ku pêtir bizane û kûrtir bifikire û aliyên veşartî ên cîhana derdora xwe bibîne, wêca bi destxistiyên xwe swarî gemiya hestyar û pirr ji xeyalên kûr ku ber bi armancekê ve dimeşin dike, û wan xeyalan dihavêje nav deryaya bêbin ya hebûna mirovan de.

Hunermend vijdana nearam û hişyar, eqlê lêger û hestekî dilovan e. Ew stêrke ku di nav şeva tarî û zulmate mirovan de diçilvile û bala mirovan ber bi cîhanekê radikşîne ku mirov bîr jê nekiribe. Di rastî de ew nojdarê jiyanê û afirînerê jiyanê ye. Dengbêjên netewa me her yek bi awayekê bi deng û awaz û kilamên xwe, riha kurdîniyê û welatperweriyê di nava canê me de cih kirin û lorîkên wan wek dengê awazên çiyayên Kurdistanê riha me bo çend demjimêran jî be aram dike.

Kurdistan welatê Kurdan seba helkevta dêmografîk û çiyayên bilind weke yek ji xweştirîn cihên Rojhilata Navîn tê hesêbandin ku bi seqayek bedev, xwediyê deng û kilam û awazên xweş û zelal e.

Herêma Urmiyê jî yek ji wan herêman e ku weke çavkaniya sitranan tê hesibandin. Her ji mêj ve ye ku sitran di vê deverê de weke parek cudanebûyî ji jiyana xelkê wê herêmê ye. Li warê Zerdeştê Kal û Emîrxanê Biradostî (Xanê Lep Zêrîn), li



Hemîd Yûsifî

welatê Cewer Axayê Şikak û nawenda şervan û şoreşgêrên Simkoyê Şikak, li xaka Ferzindeyê Celalî û li welatê Qasimloyê nemir bi dehan kes ji hunermendên şoreşvan û xebatkar hatine nava çepera xebat ji bo parastina ziman û wêjeya Kurdî.

Yek ji wan şorresiwarên rêbaza Kurdatî û welatperweriyê ku li herêma Tirgewera bajarê Urmiyê û li berbiniya çiyayê Mîrbihal dest bi xebat ji bo parastina vê dozê kiriye, hunermend Hemîd Yûsifî bûye. Navbirî li sala 1304'a rojî (2625'a Kurdî) li gundê "Mûrî" li geliyê Diriyan li malbatekî hejar û tengdest de ji dayîk bûye. Navê dayîka wî "Bilmes" û bavê wî "Mîrza" bûye.

Piştî ku Hemîd derbasî temenê 5 salî dibe, tevî malbata xwe li geliyê Diriyan bera xwe didin rojhilat û ber bi herêma Biradosta diçin û li gundê Sêro û Nêçelan û piştre jî tên herêma Tirgewer li gundê Kurrane akincî dibin. Herêma Tirgewer dikeve 25 kîlometriya bajarê Urmiyê û deştek e di nava çiyayên bilind de ye û herêmek xweş û bedev e. Gundê kurrane li vê herêmê cih girtiye û nêzîkî 100 malbatan li vî gundî akncî ne. Tewahiya xelkê wan herêman Kurd û bi zaraweya Kurmancî diaxivin.

Hemîd Yûsfî weke zaf ji hevtemenên xwe yên wî çaxî zarokatiya xwe bi guhdariya radyoya Îrewanê (Yêrîvanê) derbas dikir û di şahî û govendên xekê herêmê de bi evînekî bêdawî beşdarî dikir. Hemîd evîndarê radyoya Îrewanê bû û zaf guhdariya dengê hunermendên wek: Şeroyê Biro, Egîdê Têcir, Xelîlê Evdal, Kerapêtê Xaço û... dikir. Ew debistana Kurdî ji bo Hemîd bibû navenda hînbûna hunera Kurdî.

Hemîd Yûsfî piştî derbasbûn û akincîbûna malbata xwe, gelek zû cihê xwe di nava civakê de peyda dike û xwedî rêz û qîmetekî taybetî li cem xelkî herêmê dibe. Hemîd li gundê Kurane hêdî - hêdî mezin dibe û roj bo rojê di nava xelkê de pêtir tê naskirin.

Herwusa Hemîd Yûsifî tocarî li xebat ji bo gihîştina netewa Kurd bi mafên rewa yên xwe, kêmasî nekiribû û di demên ciwaniya xwe de têkilî bi rêkxistina Xuyîbûnê re çêkiribû û ji aliyê wê rêkxistinê ve weke kesekî welatparêz û cihê baweriyê dihat naskirin. Ew biryar û xebata hunermend Hemîd Yûsifî bê guman weke kesayetiyek welatperwer ku ji bo doza rewa ya neteweya xwe xebat dikir, li nava civakên xelkê Kurdistanê de kiribû kesekî xoştevî.

Hemîd Yûsifî li sala 1333'an a Rojî paş evînekî dûr û dirêj li gel keçekê bi navê "Sara" keça Mistefa û xelkê gundê "Mawane" ser bi herêma Tirgewer jiyana hevpar pêk tîne. Berê wê zewacê heft zarok bi navên Xalid, Senar, Fehîm, Ebdulla, Mihemedelî, Sadiq û Ebdulxaliq, û herweha dû qîz bi navên Fatima û Baran dibin.

Hunermend Hemîd Yûsifî, piştî heyamekê li ser daxwaza rêberê kurd mela Mistefayê Barzanî bo heyamekî zaf tevî dost û hevçeperên xwe Îbrahîm Newrozî li radyoya Kurdî ya Urmiyê de dest bi xebatê dike û bi vî awayî dengê Hemîd Yûsifî dibe dengê hemû malên Kurd û li hemû aliyekê dengê vî tê bihîstin.

Li çaxê xebata Hemîd Yûsifî li radyoya Urmiyê de, ew bi başî tê naskirin. Hemîd Yûsifî nêzîkî 6 salan di radyoya Urmiyê de tenê ji bo pêşxistina çanda netewa xwe xebatê dike û bi vê hêviyê ku bikare xizmetekê bi çanda netewa Kurd bike.

Piraniya stranên Hemîd Yûsifî pêka çavkaniyên cihmayî bas ji evîn, mafê hejar û paleyan, egîd û rêberên Kurd dike.

Hozan û sitranên Hemîd Yûsifî her wek deşta rengîn ya Tirgewer mirov hertim tênî û hezkirî dike. Dema ku mirov goh dide dengê hunermend Hemîd Yûsifî ku strana "Êvare, Zeriyên Gundê Me Meşiyane Avê" hesretekî mezin dikeve dilê mirov de.

Sed heyf û mixabin, mirinê ji vê çendê pêtir îzn bi Hemîd Yûsifî neda ku ji bo gel û netewa xwe xebatek pêtir kiriba û li sala 1358'a Rojî ( 2679' Kurdî) li nexweşxaneyekî de li bajarê Urmyê diçe ser dilovaniya xwe û bo hertim xatirê xwe ji gel û welatê bindest yê xwe xwast.

Lê dujmin weke her car piştî mirinê jî ji xebatkareên bi nav û deng ditirsin. Lewma pêka hin çavkaniyan, hin ji sitran û kasêtên deng û reng ên Hemîd Yûsifî li sala 1357'a Rojî ji aliyê pasdarên Komar Îslamî a Îranê ve di radyoya Urmiyê de hatine şewitandin.

Bê guman zor rûpelên zêrîn yên veşartî li jiyana Hemîd Yûsifî de heta îro rojê jî bi veşartî mane. Bi rastî hewce ye ku jiyan û serpêhatiya Hemîd Yûsifî bibe pirtûk û bikeve ber çavên hemû evîndarên huner û welatperweriyê.

Hêjayî gotinê ye ku yekem tembra nameyên fermî bi wêneyê Hemîd Yûsifî bi kincên Kurdî di destpêka serkevtina şoreşa gelên Îranê hat çapkirin û bo demeke dirêj di seranserê Îranê de mifah jê dihat wergirtin. Lê piştî heyamekê di çarçoveya siyasetên êrîşa çandî bo ser netewên Îranê ji aliyê Komara Îslam a Îranê ve, mixabin ew tembr hat rakirin.

Di nava zarokên navbirî de, tenê Ebdulxaliq Yûsifî (Kawe Urmiye) dengê babê xwe wek mîrat wergirtiye û riya babê xwe bi dengê zelal dimeşîne û xizmet bi tore û çanda Kurdî dike.




www.arsivakurdi.org

# Çanda Îranê êxsîrê destê diz û talançiyan



Ceifer Mubeşirniya

Heyamek e di kabîneya dewleta Ehmedînijad de guherîna wezîr û berpirsên navendên hikûmetî bi awayek neasayî birêve ye. Ji wan guherînên berpirsên hikûmetî, navendên çandî jî ne tenê bêpar nebûne, belkî ji hemû navendên din ên hikûmetî pêtir guherîna berpirsan bi xwe ve dîtiye.

Hikûmeta bêser û ber a Ehmedînijad ku di hilbijartinên dewra dehemîn a serokkomariyê de bi fêl û pîlanan xwe bi ser xelkê de sepand, her weke dihat çavnihêrîkirin ku bi tu awayekê nikare heta weke kabîneyên berê ên rejîma dîktator a Komara Îslamî karê xwe bimeşîne, çavnihêriyek dirust bû. Çimku di vê gerra hikûmetî de her tiştek bi elenî û bêşermane hatin çewaşekirin û li hember her nerazîtiyek dilsojên welat de jî bi tundtirîn şîweyan hêzên tepeserkar ên rejîmê hewla bêdengkirina wan dan û didin. Eva jî derxerê vê yekê ye ku karbidestên hikûmetî ên vê rejîmê bi tu awayekê nekarîn dizî û talankirinên xwe ji xelkê weşêrin û hikûmet neçar bi pejirandina vê rastiyê bû.

Lê ya herî girîng ev e, hikûmetek ku bingeha vê li ser direw û talankirinê hatiye avakirin, ger hin rastiyan jî ku nahên veşartin bipejirîne, dê bikare çi bike ji xelkê re, ku ger xelk razî jî nebe, her nebe bikare bi hin pîlan û çewaşekariyan xelkê bixapîne.

Dema ku rejîma bingeha fitne û dîktatoriyê di deverê de bi çavên xwe rabûna bayê demokrasiyê di deverê de dibîne, bê guman nevêre ji wan bûyer û guherînên berevajî berjewendiya dîktatoran xwe bixafilîne û bêdeng bimîne. Lewma bi hişyariya xelkê li hember talanên karbidestên rejîmê, bi awayek maşkanê Ehmedînijad çendîn berpirsên hikûmetî guherîn. Lê hilgirtina talançiyekê û danîna dizekê di cihê wî de, dê çi ji meselê biguherîne xêncî windakirina tawanên karbidestên xwe.

Di navbera şeş mehên derbasbûyî de, di çendîn mozexane û navendên çandî û şûnwarên kevnar ên Îranê de gellek alavên pirr buha û remza dîroka wî welatî hatin dizîn û talankirin. Lê li hember de nehat dîtin û bihîstin ku yek ji berpirsên wan navendên çandî ên di bin siya hikûmeta Ehmedînijad û Wilayeta Feqîh de ku berpirsyarên sereke ên wundabûna wan samanên giştî ne, bihên lêkolînkirin yan dadgehîkirin. Belkî bi guherîna cihên wan mûreyan dizên eslî li ber çavê xelkê winda kirin.

Jidestçûna sermayeya gişî a cihwarên kevnar, jinavçûna senetên destî ên ku welatê Îranê di cîhanê de pê dihê naskirin, vereviyana torîstan ji Îranê û çendîn pirsên din ên bi vî awayî ku rojane di nûçeyan de digîjin guhê raya giştî, berê xwesepandin û direw û çewaşekariyên talançiyên Weliyê Feqîh bûn ku bi hişyariya xelkê nehatin weşartin. Herçend ew hişyarî nebûye sedema vegeryana wan sermayeyên giranbuha ên welat.

Bi hewla ragihandin û dilsojiya hin ji karnasên çandî, pirsa han bo parlemanê hat kişandin, lê bi eşkereyî mirov dikare vê metelokê bêje ku "gotne rovî kê şahidê te ye? Got dêla min", çimku karê ku ji dîtina parlemanê ve di wî warî de erênî bû, eva bû ku daxwaz kirin saziya Mîrasa Ferhegî vegere bin siya Wezareta Êrşad a Îslamî.

Di encama wan cih guherînan de, Azad Erdekanî serokê Mûzexaneya Milî a Îranê tevî Tehmîne Danyalî Cihgira berpirsê senetên destî ên saziya Mîrasa Ferhengî, Hesen Muhsinî cihgirê Pêwendiyên Giştî û Kar û Barên Navnetewî ku peyvdarê saziyê, û Serokê Qesra Mûzeyên Seidabad û Niyaweran bûn ku di postên xwe de neman. Lê gotinek ji vegeriyana wan samanên ji destçûyî nine û pêvajoya wêranbûna mûze û cihwarên kevnar her wa berdewam e. Bo mînak, herêma kevnar a Sîmre binav bûye, alavên mûzexanê bi awayek yekdest bo saxtimana berê a Saziya Mîrasa Ferhengî hatine veguheztin û navek ji birêveberên wê saziyê nine û ew alav di navbera karbidestên hikûmeta Ehmedînijad de dest bi dest digerin.

Eva rewşa wêran a çanda welat û cihwarên kevnar û wan samanên giştî ên welat in. Serbarê vê yekê ku pirsên din ên çandî ên weke daxistina rojname û ragihandinên din ên azad, qedexekirina mûzîkê, destbiserkirina hunermendan û ... di xirabtirîn rewş de ye û bi hovanetirîn şîwe tepeseriyên han ji aliyê kopalbidestên Weliyê Feqîh dimeşin û kuştina huner û bi giştî çanda welat ji aliyê vê rejîmê ve tu gumanek tê de nemaye.

# *EZ AMED IM*

**Medenî Ferho**

**Ez Amed im...**
**di kolanek qedîm de stunek ezmenî û dengê zaroka di pêçekê de me.**
**Wek bangeke nû di jiyanê de bi hêvî û daxwaz..**

**Ez Amed im, daxwazek azadiyê, wek bircikên raserî Dicle difurim... Wek bîranînek jibîrkirî; di nava komek barûd û parçeyên şerapnelê de, di dengê tank û topan de, di dengê balafirên F 16 de dijîm.....**

**Ez Amed im... Her sibeh bi kuştineke nû,**
**Her sibeh bi bûyîneke nû dijîm**
**Wek hawarekê raserî Tigrîsa tî û birçî me ez**

**Ez Amed im û ber bi kûraya dîrokê diherikim...**
**Dîrok bi min tê nas kirin...**
**Li wargehekî talankirî,**
**dayîkek bi hêvî me ez**
**Di pêlên Tigrîsê de gotinan darve dikim û dikelim**
**Û dikime hawar...**
**Li ser çardara ciwanekî evîndar**

**Ez Amed im, ew ciwanê li ser çardarê**
**Ew ciwanê di nobedariya sersibehiya welat de**
**Ew zaroka li kolanê kevir di dest de**

**Ez hêrsa dayika dildaxî me...**
**Wek bayekî fetsînok, wek dilojarêyek şikestî**
**Ez Amed im... Kul û derd im ez, xemgînî êş û azar im ez...**

**Wek kefenekî reş li ser bedena ezman û li ser bedena erdê rûniştî me ez.**

**Ez Amed im... Ji kevirekî reş derketim rê, wek beden û govend li ser herka dîrokî me û wek destnîvîsan li ser taqan rûniştî me. Dîrokek tarûmar, kulturek jibîrkirî, zimanekî şikestî me.**

**Ez Amed im...**
**Li dijî xencera xiyanetê mertalê zînkirî me...**
**Li dijî inkarê agirê Zerdeştî me... Şûrekî di kalan de veşartî me**
**Û di rengê Şahmaran de jiyanê diparêzim.**

**Ez Amed im, di riya gihiştina asoyên winda de Parçeyek teqîn, parçeyek fîşek, parçeyek barût, parçeyek xencera reş, parçeyek şerapnel û palêtên tank û topa me... Nîvê min, kuştî ye, nîvê din têkoşîn e... Nîvê min birîn e, nîvê min derman e...**
**Wek Teyrê Sîmûr im xwe derman dikim û bextreşa Şamaran im...**

**Ez Amed im... Dîroka li dijî dîrokê hatiye avakirin im ez.**
**Ji aliyekî ve Dicle me, ji aliyê din ve Mezopotamya me...**
**Serhed û Botan, deşt û newal im ez, kanî û navenda kûça cîhanê me ez.**
**Ji aliyekî ve Kurd im, ji aliyê din ve Ermenî me, Suryanî û Keldanî me ez...**
**Ji aliyekî ve koçberî me, ji aliyê din ve nifiştoka dergehê bedestanên talankirî me...**
**Heftê û heft artêşên dagîrker, wek xunafa mirinê bi ser min de bariyan.**
**Wek mertalek heft gelên di pêsîra xwe de, bi çiyan re bûme yek...**
**Di hafa jiyana heftrengî de bûme zarok û dîlana azadiyê...**
**Ez kuştim, lê min jiyan parast**

**Ez Amed im, zaroka di pêçekê de, zaroka di serîhildanê de.. Ez dilopek ji xwîna Egîd û**
**Mazlum im...**
**Dilopek ji xwîna Elî û Akîf...**
**Dilopek ji xwîna Kemal im ez...**
**Dilopek ji xwîna kevirê destê zaroka me ez...**

**Ez Amed im... Geh Enes im, geh Mehmed û Îsmaîl im ez...**
**Geh Evîn im, geh Mizgîn û Şîlan im ez... Geh zarok, geh ciwan im ez...**
**Geh jin, geh mêr û berxwedanim ez... Bedena li ser çardaran im ez...**

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



## Kirmaşan, rekorddarê telaqê;
### di her 2 demjimêran de telaqek



Li gor serjimêriyên bilavbûyî di warê telaqê di Îranê de, di çend salên derbasbûyî de, rêjeya diyardeya han di wî welatî de jorde çûye, lê asta jordeçûna telaqê li parêzgeha Kirmaşanê de li çav herêmên din ên Îranê zêdetir e. Bi awayek ku li her 2 demjimêran de telaqek çê dibe.

Li gor nûçegihaniya "Hemşehrî onlain", di sala 1389'an de, 4 hezar û 174 telaq di wê parêzgehê de hatine tomarkirin ku li çav sala 1388'an, %13 zêdetir bûye. Herwha di hemen sal de amara zewacê %3.3 kêmtir bûye. Eva di demekê de ye ku navinciya telaqê di sala 1390'an de zêdetir bûye û ji her 5.6 zewacan, zewacek bi telaqê bi dawî tê.

Li gor serjimêriyan di sala derbasbûyî de zêdetirîn rêjeya telaqê di parêzgehên Tehran, Kirmaşan û Xurasana Rezewî de bûye. Bi wateyek din, parêzgeha Kirmaşanê li çav nifûsa xwe rêjeya herî zêde a telaqê heye.

Rehman Merdanî, parêzer û pisporê hiqûqî di vî warî de dibêje ku îtiyad, bêkarî û pirsgirêkên rehetiya jiyanê sedemên bingehîn ên telaqê ne.

## Li sê mehan de 30 hezar zarokên
### Somaliyayî cane xwe ji dest dane



Çavkaniyên Amerîkayî bas ji mirina 3o,ooo zarokên Somaliyayî li sê mehên borî li encama birçîtî û hişksaliyê de didin. Gelek ji wan zarokan di riya xwe gihandina bi kempên alîkarî gihandinê bi belengazan cane xwe ji dest dane.

Karnas û pispor li ser vê baweriyê ne ku hêj dê rewşa wan dijwartir be û kirîzek însanî li rê de ye. Ew texmîn dikin ku hêj 3 milyon kes li Somaliyê de hewcehî bi alîkariyên bilez hene, lê bi sedema şerê navbera girûpa îslamgeraya Elşebab û YA'ê de gihandina hevkariyan zehmete.

## Kom û civînên li ser Fecbookê
### rejîma Îranê nîgeran kiriye



**Binyatên ewlekariyê yên rejîma Îranê di vê derheqê de ku ji Fecbookê bona agehdarkirina yektir di warê bernameyên bi kom de mifah tê standin, pirr nîgeranin.**

Di vê navberê de malpereke emniyetî, birêvebirina bernameyên bi kom li ser Fecbookê wek şerê nerm û bi rêkxistinkirî ji hêla Tevgera Kesk ve da nasandin.

Bernameyên "lîstika bi avê(awrêşkanê) û Xez bazî" du bername ne ku di hefteyên borî de bi awayê bi kom di Tehranê de ji hêla ciwanan ve birêve çûn.

Malpera "*Bolton news*" ku ser bi binyatên ewlehiyê ye, pirojeyên bi vî rengî wek pirojeyên aloz yên dijminên komara Îslamî binav kir, û nîgeraniya xwe derheq gihîştina wan pirojeyan bo herêmên din eşkere kir.

Birêveçûna wan rê û resmên baskirî bû sedema nerehetiya tundrewên hikumetî, bi awayekê ku hinek ji nûnerên parlementoya Îranê jî ragehandin ku vê pirsê di parlementoyê de jî wê bixin ber basê.

*Her eva mabû ku ew jî rengek siyasî bigre û aqibet bê qedexekirin. Rejîmek ku tirs ji lîstin û awreşkanê jî heye!!!*

## 11 hezar Lubnanî bi berîkên
### xelkê Îranê dijîn



**Hemû malbatên li jêr piştevaniya Komîteya "Îmdad" di Lubnanê de ku pêtir ji 6 hezar malbatan û ji 11 hezar kesan pêk tê, û bi diravê îraniyan dijîn.**

Serperestê Komîteya Îmadad a Xumênî bi bîranîna çalakiyên dervey sînor ên vê komîteyê li dervey welat got: Niha pitirî 40 hezar kesî di welatên misilman ji xizmetên Komîteya Îmdad xwedîpar in.

Husên Enwarî di gotûbêjekê de tevî Îrna'yê got: "Di welatên Lubnan, Îraq, Efxanistan, Komara Azerbaycanê, Komor, Sûriye û Tacîkistan û herweha hin welatên din de, Komîteya Îmadad bîroya nûneratiyê heye.

Eva jî di halekê de ye ku hêla hejariyê di Îranê de jorde çûye û beşek berbiçav ji xelkê destkurt û hewcedarê nanê şevê ne.

## Aqibeta dîktatoran: Husnî Mubarek û lawên
### wî di qefesa hesinî de hatin dadgehîkirin




**Yekemîn civîna dadgehîkirina Husnî Mubarek, du kurên wî (Ela û Cemal) û tawanbarên din di demekê de dest pêkir ku serkomarê pêşin yê Mîsrê bi birankardê bo dadgehê hat anîn, û kurên wî jî Quran bi dest, bo cara yekemîn piştî li ser kar rakirina Mubarek, di qefesê de bi bavê xwe re hevdîtin pêk anîn.**

Li gorî vê nûçeyî gişt parêzerên mafên medenî yên amade di dadgehê de, daxwazkarê vê yekê bûn ku Husnî Mobarek seba kuştara xelkê Misrê li bajarên cur bi cur de, bihê cezadan.

Ew parêzer herweha daxwazkarê gazîkirina jineral Mihemed Husên Tentawî, wezîrê parastinê û serokê Civata Bilind ya Leşkerî ya birêveberê Mîsrê, û Omer Silêman, serokê Saziya Îtilaatê û cîgirê serkomar û Samî Enan serokê Sitada Hevbeş ya hêzên çekdare Mîsrê bona şahidîdanê bûn.

Hêjayê basê ye ku piştî xwendina rîzbenda tawanên li ser Husnî Mubarek, wan ew tawan li ser xwe ret kirin. Dadwer jî dadgehîkirina wan bo 15'ê Tebaxê paşde xist.

**Eva jî Aqibeta dîktatoran Nexşe li yên mayî.**



www.arsivakurd.org